Em dixwazin ku hun di derbarî Nirxandina Nêrevanan de ……. …. Hin tiştan bizanin

Nêrevan jî xwediyê maf in!

Heke ku hun nêrevaneke ku, bêpere li mêrê/jina xwe, an li yek ji endamên malbata xwe an li hevaleke/î xwe ya/yê ku, bê we, nikare xwe îdare bike, dinêrin in, mafê/heqê we heye ji bo nirxandineke nêrevanê.

Qanûneke nû – **Qanûna (Firsetên Wekhev) ya Nêrevanan**- dixwaze ku zêdetir bijartek/tercîh û firsetên baştir bide nêrevanan.

Hewce nake ku hun bi mirovê ku hun lê dinêrin re bijîn, û heke ew nexwazin ku ji Xizmetên Sosyalê alîkarî bigirin jî, mafê we heye ji bo nirxandinekê.

Nêrevan di hemû umir/temenan de ne. Nêrevanek dibe ku:

- Mirovek mezin yê/ya ku li mirovekî mezin ya/yê din dinêre be
- Mirovek mezin ya/yê ku li zarokek xwedî seqetiyan dinêre be
- Mirovek ciwan ya/yê di bin 18 salî de ku li dê an bavê xwe dinêre be

Çima ihtiyaca we bi nirxandinekê heye

Nirxandinek firset dide we ku hun gotûbêj bikin di derbarî ka ji bo karê we yê nêrevaniyê û ji bo sihet û xweşhaliya we, ihtiyaca we bi tu alîkariyê, heye an na. Gotûbêj, bi gelemperî, wê bi mirovek ji Xizmetên Sosyalê an pisporeke sihetê an nirxînereke din ya pejirandî re were kirin.

Xizmetên Sosyalê, vê nirxandinê, wê ji bo ka ew ê çi alîkarî û destekê bide we, bi kar bîne.

Nirxandin çawan tê kirin?

Nirxandina/tespîtkirina ihtiyacên we bi gelemperî di cîvîneke rû bi rû de tê kirin. Hin caran jî, di eynî dema ku nirxandina lênêrîna civakê ya mirovê ku hun lê dinêrin, tê kirinde de, tê kirin, heke ku hun herdu jî vê yekê qebûl bikin.

Wek alternatîf, hun dikarin daxwaz bikin ku nirxandina we di demek din de bê kirin.
Hun dikarin bi xwe re hevalek an piştgirek/parastvanek jî bînin ji bo ku ew ji we re di warî îfadekirina ihtiyacên we de bibin alîkar.

Pirsên ku em ê ji we pirs bikin

- Wek nêrevanekê, hun çi karan dikin?
- Hun dikarin û dixwazin ku nêrevaniyê bidomînin?
- Hun (bi peretî li ciyekî) dixebitin, an hun dixwazin ku (bi peretî) bixebitin?
- hun dixwazin hîndekarî bibînin an perwerde bibin?
- Aktîvîteyên ku we di dema xwe ya vala da dikir, lê belê, ku hun êdî wan nikarin bikin ji ber ku hun li mirovekê dinêrin, hene an na?

Xizmetên Sosyalê dikare alîkarî û destekê sererast bide we an bide mirovê ku hun lê dinêrin.

Çi hewce dike hun bikin

Bifikirin di derbarî ihtiyacên xwe de û zelal bin di derbarî ka hun di çi sewiyê de dikarin li mirovekê binêrin.

Piştî hun tên nirxandin

Qopyeke nirxandinê û pîlana destekê, ya ku li ser, we û nirxînerê, li hev kiriye, wê ji we re bê şandin. Heke ku we xizmetekê xwestibe, ew ê her wiha ji we re bê teyîdkirin ka ji bo vê yekê, çiqas pere hatiye veqetandin.

Em ê bidin garantîkirin ku hun bibin xwedî agahî di derbarî:

- ka ew ê piştre çi bibe
- ka ji bo destekê hun dikarin bi kê re bikevin têkiliyê
- tarîxa ku em ê ihtiyacên we ji nû ve berçavan re derbas bikin ku em bidin garantîkirin ku alîkariya ku em didin bi kêrê we tê û têra we dike.

Heke ku hun di derbarî encama nirxandinê de tatmînkar nînin, hun dikarin li hember biryarê îtîrazekê an giliyekê bikin.

Hun çawa dikarin ji bo kirina nirxandinekê daxwazî bikin

Ji menejerê lênêrînê re an ji kordînatorê lênêrînê ya mirovê ku hun lê dinêrin re bêjin. Heke ku têkiliya we bi tu keseke ji Xizmetên Sosyalê re tune, bi li vir re bikevin têkiliyê:

Carers Support Team
Haringey Social Services
40 Cumberland Road
London N22 7SG

Tel: 020 8489 3967
Email: carerssupportteam@haringey.gov.uk